

BUROYA KURDÎ **ya Pêwendî û Agahdariyê**

Bultena agahdariyê N° 53 - Îlon 2009
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

NÛÇE JI KURDISTANÊ

TEBAX 2009

KURDISTANA TIRKIYÊ

BÎRÊN MIRINÊ (dûmahîk)

Di dema kolanên li gundê Akçayurtê, li parêzgeha Diyarbekirê de, hestiyên laşekî bê serî hatin dîtin. Tê bawer kirin ku ev laşê muxtarê kevn ê vî gundî, Mehmet Gülhan, ku di 1994 de hati bin çav kirin, e.

Li gora rojnamevanê rojname tirkî Hürriyetê, Cem Emir, piştî binçavkirina vî muxtarî, haya tukesî jê ne bû. Kolan li ser daxwaziya kurrê muxtar, Hikmet Gülhan, li bal dozkarê (prokuror) dadgeha leşkerî, hat kirin. Hestî, ji bo venêrînê, hatin şandin servîsa bijîjkî (tîbbî).

(rizgari.org, 03.08.2009)

ZAROKEKÎ KURD NIKARE BIKEVE TIRKIYÊ


Zarokekî kurd, Ciwan, ku li Stuttgartê, li Almaniya, dimîne, tevî dê û xuşka xwe çû ber bi Malatya, Kurdistanê Tirkîyê. Li firokexanê, ev zarok tenê hatin vegehandin Almaniya, ji semeda navê wî ku tê de tîpa “W”, ku di tirkî de nîn e, heye !

(avestakurd.net, 03.08.2009)

ERDOĞAN RASTÎ PARLEMENTERÊN KURD TÊ

Di 05 Tebax 2009 de, Recep Tayyip Erdoğan, bi sifeta serokê partiya îslamî ya desthilatdar, AKPê, rastî serokê koma ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê, Ahmet Türk, û şanda ku pê re hat. Wezîrê hundir, Beşir Atalay,

û cîgirê serokê AKPê, Bekir Bozdağ, hogiriya Erdoğan kir.



Rasthatin li buroya Erdoğan, li parlamentê, bû û katjmêrek (saetek) ajot. Her du alî ji dyalogê razî bûn.

Berê çend rojan, wezîrê hundir rastî jimareke ronakbîrên tirk û kurd, ji bo bihîstina dîtinên wan li ser pîrsa kurdî, hati bû.

(Milliyet, Hürriyet, netkurd.com, avestakurd.net, nefel.com, peyamner.com, 05.08.2009)

ŞAREDAREKÎ KURD DIÇE SEREDANA KURDISTANA IRAQÊ

Di 10 Tebax 2009 de, şaredarê Sûrê, ku şaredariyeke bajarê Diyarbekirê ye, Abdullah Demirtaş, tevî şandekê rastî parêzgarê Duhokê, Temer Ramazan, hat.

Seredan li ser vexwendina (dawet) parêzgarê Duhokê, ji bo xurtkirina pêwendiyên çandî, civakî ... di navbera her du aliyan de, bû. Ewê şande biçê seredana jimareke sazandeyan, ji bo ku li ser rewşa servîsên vê parêzgehê agahdariyan bistîne.

(peyamner.com, pukmedia.com, 10.08.2009)

162 WAJOYÊN RONAKBÎRÊN TIRK Û KURD

Di 11 Tebax 2009 de, 162 ronakbîrên tirk û kurd daxuyaniyeke ku wan tê de piştigiriya xwe ji bo pêvajoya nuh ku ji aliyê berpirsiyarên fermî yên tirk, ji bo tecrubekirina dîtina çareyekê ji pîrsa kurdî re, dest pê kiriye, nîşan da wajo (imza) kir.

(Milliyet, netkurd.com, 12.08.2009)

WEZRÎRÊ HUNDIR RASTÎ PARLEMENTERÊN KURD TÊ

Di 13 Tebax 2009 de, wezîrê tirk ê hundir, Beşir Atalay, bi hogiriya cîgirê serokê partiya desthilatdar AKPê, Abdulkadir Aksu, û cîgirê serokê koma vê partiyê li parlamentê, Bekir Bozdağ, çû avahiya partiya kurdî DTPê.

Wezîr rastî serokê koma parlementerî ya DTPê, Ahmet Türk, û her du cîgirên wî, Selahattin Demirtaş û Banû Hatice Çoban, hat.

Her du alî ji giftûbêjan razî bûn û got ku divê ku pîrsa kurdî bi awakî ramyarî (siyasî) bê çare kirin.

(netkurd.com, avestakurd.net, pukmedia.com, radaw.net, nefel.com, 13.08.2009; Hürriyet, 14.08.2009)

ERDOĞAN LI SER HELBESTVAN Û STRANBÊJÊN KURD DIPEYIVE !

Di 13 Tebax 2009 de, di civîneke koma parlemeterî ya partiya desthilatdar AKPê de, serokwezîrê tirk, ku di heman (eynî) demê de serokê vê komê ye, Recep Tayyip Erdoğan, li ser biratiya di navbera gelên Tirkiyê de peyivî. Ew li ser helbestavanê kurd ê navdar ê sedsala 17mîn, Ehmedê Xanî, û stranbêjê îro, Şivan, peyivî û got ku stranên wan hestên (hiss) wî gelek rakirin !

(avestakurd.net, 13.08.2009)

FÊRÊN KURDÎ LI ZANÎNGEHA MÊRDÎNÊ

Berê mehekê, 15 akadêmîkên tirk dest bi hînbûna zimanê kurdî li zanîngeha Artuklu, li Mêrdînê, kir. Mamoste, Dr. Selîm Temo, got ku wî ji wan re destgehên fêrbûnê yên taybetî amade kirine.

(netkurd.com, avestakurd.net, 18.08.2009)

BERPIRSIYAREKÎ KURD TÊ TAWANBAR KIRIN

Di Tebax 2009, dadgeha Riha (Urfa) serokê şaxa Riha ya partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye DTPê, Vakkas Dalkılıç, bi 11 meh zîndan, ji bo ku wî weşandina muzîka kurdî di civîneke vê partiyê de qedexe ne kir, hat tawanbar kirin.

Ev biryar li ser bingeha bend 81c a zagona (qanûn) li ser partiyên ramyarî (siyasî), ku weşandina bi zimanên ne tirkî di bûyerên ramyarî de qedexe dike, hatiye stendin.

(rudaw.nl, 20.08.2009)

JÊPIRSÎNA KEÇEKE PIÇÛK



Di Tebax 2009 de, dozkarê (prokuror) Komarê yê Diyarbekirê dest bi jêpîrsîna keçeke kurd a piçûk a 10 salî, Medya Örmek, û dê û bavê wê kir, ji bo ku wê salek fêrên zimanê kurdî da zarokan û bawername (dîplom) dan wan !

Medya Örmek ev fêr, bi piştigiriya şaredarê Sûrê, Abdullah Demirtaş, li mala xwe dan. Wê daxuyand ku ew tirkî nizane û ku ewê li dadgehê bi kurdî bipeyive !

(rizgari.org, 26.08.2009; avestakurd.net, radaw.net, 27.08.2009; kurdistan-news.net, 29.08.2009; Milliyet, 30.08.2009)

BUROYEKE PARTIYA KURDÎ DTPÊ TÊ ŞEWITANDIN

Di 27 Tebax 2009 de, nijadparêzên tirk buroya Riha (Urfa) a partiya DTPê şewitand, berdevkê vê partiyê, Ibrahim Ayhan, daxuyand. Û wî bi ser de jî got ku zararên maddî yên mezzin bûne.

(azady.nl, 27.08.2009)

36.000 MALBATÊN EREB PENA BÛNE KURDISTANÊ

Li gora serjmartinên (statîstîk) bawerbar, 36.000 malbatên ereb, ji Başûr û Navenda Iraqê, pena bûne (iltica) Kurdistanê. Her meh, çend malbatên û 2-3 malbatên din jî ji bajarên Suleymaniye û Hewlêrê vedigerin ciyên xwe.

(pukmedia.com, 06.08.2009)

ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN KURDÎ YÊN EREBKIRÎ

Di 06 Tebax 2009 de, polîsê Kerkûkê daxuyand ku erebeke mînkirî li taxa Rahîmawa ya vî bajarî teqiya. 4 kes hatin kuştin û 35 jî birîndar kirin.

(peyamner.com, pukmedia.com, 07.08.2009)

Di 10 Tebax de, polîsê parêzgeha Nînewa (li Bakurê Mûsilê) daxuyand ku du erebeyên mînkirî li gundê Xeznê, yê nahîya Bertelê, bajarê Hamadaniyyê, 30 kes kuştin û 130 jî birîndar kirin. Qurban Kurdên şebek (şî) bûn.

(peymaner.com, netkurd.com, azady.nl, 10.08.2009)

Di 12 Tebax 2009 de, du têrrorist li qehweyekê li Şengalê, parêzgeha Mûsilê, ku tê de Kurdên yezîdî dimînin, xwe teqand. 17 kes hatin kuştin û 26 jî birîndar kirin. Berê du salan, di 14 Tebax 2007 de, erebeyeke mînkirî cardin li Şengalê 525 kes kuştî bûn û 700 jî birîndar kiri bûn.

(peyamner.com, pukmedia.com, netkurd.com, avestakurd.net, rizgari.org, azady.nl, 13.08.2009)

Di 17 Tebax 2009 de, bombeyek li ser karwaneke hêzên leşkerî li nêzikî garaja Bexdadê, li Kerkûkê, hat avêtin. 8 kes birîndar bûn.

(pukmedia.com, 17.08.2009)

Di 21 Tebax 2009 de, têrroristek êrîşî Ehmed Ibrahîm Faris, jina wî û zarokên wan, li Daqûqê, parêzgeha Kerkûkê, kir. Jin û zarok bi giranî hatin birîndar kirin, birevebirê polîsê, Serhed Qadir, daxuyand.

Balyozê amerîkî li Iraqê, Christopher Hill, çû seredana Kerkûkê û tê de rastî berpirsiyarên ramiyê (siyasî) yê cihê hat, ji bo ku li ser rewşa ramiyê û ewlehiyê li Kerkûkê giftûbêj bike. Ew bi wan re li ser pêwîstiya hevjiyanê û bicîanîna bendên destûra iraqî peyivî.

(peyamner.com, 21.08.2009)

Di 29 Tebax de, erebeke mînkirî li bazareke nahîya Sinûnî, li navçeya Şengalê, li nêzikî Mûsilê, ku tê de **Kurdên** yezîdî dimînin, teqiya. 6 kes mirin û 40 jî birîndar bûn.

(peyamner.com, rudaw.net, pukmedia.com, netkurd.com, avestakurd.net, 29.08.2009)

CARDIN PÊTROL LI KURDISTANÊ

Di 06 Tebax 2009 de, şirketeke pêtrolê, Gulf Keystone, daxuyand ku wê li navçeya Şêxanê, li nêzikî Duhokê, bireke mezzin a pêtrolê, bi kûrayiya 1510-1450 m., ku tê de 300-500 milyon bermîl pêtrol hene, dît.

Pispor dibêjin ku ewê li gelek derên din jî li Kurdistanê bibînin.

(pukmedia.com, 07.08.2009; avestakurd.net, 10.08.2009)

HILBIJARTINÊN SEROKÎ Û PARLEMENTERÎ (dûmahîk)



Di 07 Tebax 2009 de, encamên dawîn ên hilbijartinên serokî û parlementerî li Kurdistanê Iraqê, ku di 25 Tîrmeh 2009 de bûn, li Bexdadê ji aliyê Encumena Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan hatin daxuyandin :



- Mesûd Berzanî, Serokê Kurdistanê : 69,6%
- Lîsta Kurdistanî : 59 kursî, 59,2%
- Goran : 25 kursî, 24,5%
- Xizmetguzarî û Sazkarî (2 partiyên islamî û 2 marksîst) : 13 kursî, 13,2%
- Bizava Islamî : 2 kursî
- Azadî û Wekhevî : 1 kursî
- Bizava Tirkmenî : 3 kursî

(peyamner.com, azady.nl, 07.08.2009; pukmedia.com, aknews.com, netkurd.com, avestakurd.net, nefel.com, 08.08.2009)

Di 20 Tebax de, parlamenta nuh civîna xwe ya pêşîn kir. Parlementerên nuh û serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, bi amadebûna serokê Iraqê, Celal Talabanî; nimînendeyên ramiyên yê Iraqê û balyozên (sefîr) çend welatên rojavayî û rojhilafî, sond xwar. Kemal Kerkûkî, cîgirê serokê parlamentê yê berê, weka serok hat hilbijartin û sirûda neteweyî ya kurdî « Ey Reqîb » hat lîztin. Heta nuha, vê parlamentê 92 zagon (qanûn) û 49 biryar derxistine.

([TV, malper û rojnamên kurdî](http://TV_malper_û_rojnamên_kurdî); Al-Hayat, 20.08.2009)

DU GORÊN HEVRAYÎ

Di 09 Tebax 2009 de, di konfêranseke çapemeniyê ya hevrayî ya wezîra Iraqê ya mafên mirov, Wijdan Mixaîl Salim, û wezîra kurd a Gorî (Şehîd) û Enfalkiriyên, Çinar Sa'd Abdullah, de Banû Salim daxuyand ku du gorên hevrayî ku tê de bermayiyên bi sedan Kurdên qurbanên Enfal hene li parêzgeha erebî ya Diwaniyya hatin dîtin.

Di vê konfêransa çapemeniyê de, Banû Salim daxuyand jî ku planeke sê qonaxan heye û ku yek ji wan bankayeke ku ewê jimara tevane ya qurbanên Enfalê bibîne ye. Her du wezîr li hev kir ku ji laboratwareke DNA li Hewlêrê bixwazin ku venêrînan (têst), bi hevkarîya Enstituya Bijîjkî (tibbî) li Bexdadê, bike.

(rûdaw.net, pukmedia.com, 10.08.2009)

NIMÎNENDETIYÊN 16 WELATAN LI KURDISTANÊ

Di 12 Tebax 2009 de, berpirsiyarê pêwendiyên derve yê hukûmeta Herêma Kurdistanê Iraqê, Fellah Mustafa, daxuyand ku 16 welat nimînendeyên wan ên dîplomatîk li Kurdistanê hene : 4 konsulxane, 3 buroyên balyozxaneyan (sefaret), 4 buroyên bazarganiyî û 5 konsulxaneyên rûmetê (fexrî). Û wî got jî ku sedemên vê yekê ewlehî (emniyyet) û aşîti li herêmê, vebûna deriyên Kurdistanê ji welatên biyanî û civaka navneteweyî re, çalakiyên fireh ên bazarganiyî, hebûna ferzendên (firset) kar û têgihajtina van welatan rastiya Herêma Kurdistanê ne.

(avestakurd.net, 13.08.2009)

SEREDANA WEZÎRÊ MISRÎ YÊ ABORÊ

Di 13 Tebax 2009 de, serokê Kurdistanê Iraqê, Mesûd Berzanî, pêşwaziya wezîrê misrî yê aborê, Mehmûd Muhiddîn, bi hogiriya nimînendeyên 7 komên bazarganiyê, kir. Amanca vê seredanê xurtkirina pêwendiyên aborî, pîşesaziyî (sinaî), tûrîstîk ... bû.

(pukmedia.com, 13.08.2009; krg.org, peyamner.com, rudaw.net, 14.08.2009)

SEREDANA ŞANDEKE PARLEMENTERÎ YA AMERÎKÎ

Di 15 Tebax 2009 de, şandeye Kongrêsa Amerîkî, bi serokatiya sênator John McCain, çû Hewlêrê, piştî seredana Bexdadê. Ew tê de rastî serokê Kurdistanê, Mesûd Berzanî, bi hogiriya serokwezîr Nêçîrvan Berzanî, serokê parlamena Kurdistanê û berpirsiyarên ramiyên yê kurd ên din, hat.

Mîrza McCain daxuyand ku amanca vê seredanê xurtkirina pêwendiyên di navbera Amerîka û Herêma Kurdistanê de ye û ku ew ji bo pêşveçûna mezzin a Kurdistanê gelek dilxweş e. Her du alî li ser hilbijartinên dawîn ên Kurdistanê û pêwendiyên bi Bexdad û Tirkîyê re giftûbêj kir.

(peyamner.com, pukmedia.com, aknews.com, netkurd.com, avestakurd.net, 15.08.2009; nefel.com, Al-Hayat, 16.08.2009)

RAKIRINA QELENÊ LI BAL YEZÎDIYAN

Di 14 Tebax 2009, di civîneke taybetî li Şêxanê, li Kurdistana Iraqê de, Encumena Rûhanî ya Yezîdîyan biryar stend ku qelena ku ji keçan re di dema mêrkirinê de tê dayîn gelek bê daxistin û ku bi nirxekî remzî (sembolîk), 75 gr. Zêrê 21 qîrat, bê sînor kirin.

(pukmedia.com, 15.08.2009)

SEREDANA NIMÊNDEYÊ YEKÎTIYA EWROPÎ

Di 23 Tebax 2009 de, nimênendeyê Yekîtiya Ewropî li Iraqê, Elka Asitalo, bi hogiriya şandekê, rastî berpirsiyarên kurd ên cihê li Hewlêrê, Mesûd Berzanî, serokê Kurdistanê; Nêçîrvan Berzanî, serokwezîr, û Dr. Kemal Kerkûkî, serokê

parlementa Kurdistanê, hat. Her du alî li ser hîlbijartinên li Kurdistanê û pêwendiyên bi Bexdadê re peyivîn.

(kurdistan-news.net, 23.08.2009; peyamner.com, avestakurd.net, 24.08.2009)

ZARARÊN ENFALÊ 8 MILYAR DOLAR IN

Di 26 Tebax 2009 de, wezîra Gorî û Enfalê, Çidar Sa'd Abdullah, di konfêranseke çapemeniyê de daxuyand ku wezaretê wê rapporek li ser zararên kampanya Enfalê ya Saddam Huseyn nivîsî û da hukûmeta iraqî li Bexdadê. Wê bi ser de jî got ku tevayiya van zararên digihêje 8 milyar dolar.

(peyamner.com, 26.08.2009; avestakurd.net, kurdistan-news.net, 27.08.2009)

KURDISTANA ÎRANÊ

DU HUKMÊN ÎDAMÊ

Raşîd Axoknadî, ku bi xebata li dijî hukûmeta îranî û hevkarîya komên dijberiyê (muxalefet) yên kurdî hatiye tawanbar kirin, di 01 Nîsan 2008 de li Isfahanê hat ragirtin û şandin zîndanê, bê ku mafê wî hebe ku parêzerekî bistîne. Piştî salekê, wî hukmê îdamê ji Dadgeha Şoreşgerî ya Sinê (Sanandaj), li Kurdistana Îranê, stend.

(hra-iran.org, 06.08.2009)

Şakir Baxî, girtiyekî ramyarî (siyasî) yê Tirkîyê, ku bi endambûna rêxistinên kurdî û haraşakirina (tehdîd) ewlehiya neteweyî hatiye tawanbar kirin, hukmê îdamê stend, bê ku mafê wî hebe ku parêzerekî bigire. Di 15 Tebax 2009 de, ew ji zîndana navendî ya Sinê hat birin a Kaşmarê.

Baxî di 11 Adar 2007 de li Sinê hati bû ragirtin. Ew sê mehan bi awakî gelek giran, bi canî û psîkolojîk (nefsî), hat êşkence kirin. Piştî, hat birin zîndana navendî ya Sinê. Du sal şûn de, azadiyê sînorkirî jê re hat dayîn. Malbata wî, ji bo ku bitenê çend xulekan (deqçe) wî bibîne, ji Tirkîyê hat.

(hra-iran.org, 16.08.2009)

MIRINA DU GIRTIYAN

Mahmûd Rahmanî, Kurdekî Javanrûdê, piştî ku 8 sal li kampa penaberan El-Taş (li sînore iraqî-urdunî) derbas kir, vegeriya Îranê. Dema ku gihajt, ji aliyê hêzên ewlehiyê hat ragirtin û ji bo hevkarîya bi partiyên ramyarî yên kurdî re bi 15 sal zîndan hat tawanbar kirin.

Ji sedema salên pêşîn ên zîndanê, saxiya Rahmanî xerab bû, lê destûr jê re ne hat dayîn ku ew li

derveyî zîndanê bê sax kirin. Piştî 8 sal zîndan, nexweşiya gurçikan a vî zîlamê 70 salî ewqas giran bû ku ew hat azad kirin. Du hefte şûn de, ew li nexweşxanê, di 31 Tîrmeh 2009 de, mir.

(hra-iran.org, 06.08.2009)

Kamal Mohammed Pûr, girtiyek li bajarê Saqezê, li Kurdistana Îranê, li zîndanê hat kuştin û laşê wî li nêzikî vî bajarî di 29 Tîrmeh 2009 de hat dîtin.

Par, Mohammad Pûr bi pevçûnên bi efsêrên (zabit) nizama vî girtîgehê re hati bû tawanbar kirin û hukmê 3 sal zîndan stendi bû.

(hra-iran.org, 13.08.2009)

RAGIRTINEK

Di 31 Tîrmeh 2009 de, Roşan Alî Moradî, çalakvanekî ramyarî (siyasî), li Sareh Poleh Zahab, parêzgeha Kermanshahê, li Kurdistana Îranê, hat ragirtin. Wî kampanyake ramyarî ji bo sala 2009 dajot. Malbata wî tu nûçê ji wî ne stendiye.

(hra-iran.org, 12.08.2009)

TÊKDANA ANTÊNÊN TÊLÊVÎZYONÎ

Di 04 Tebax 2009 de, Rêxistina almanî ji bo Gelên Haraşakirî (tehdîdkirî) „GfbV“ daxuyand ku hêzên ewlehiyê yên îranî antênên têlêvîzyonî li Kurdistana Îranê têk dan (xerab kirin), ji bo ku nehêlin ku Kurd bigihêjin mîdyayên navneteweyî.

Li gora danîşmendê (muşawir) GfbV, Dr. Kemal Sîdo, xelk dikare agahdariyan bitenê bi riya malperên entêrnêtê ku ji çavdêriya (kontrol) hukûmeta îranî derdikevin bistîne, lê ku ev bitehlike ye, ji bo ku pergaleke (sîstêm, nizam) rejîmê ya

çavdêrîkirina entêrnêtê ya pîrr pêşketî heye. Li gora wî, kesên merd ên ku wê bi kar tînin dikarin bi bikaranîna „proxy-servers“, face-book.com yan youtube.com xwe ji parzûnkirina (filtrage) malperan dûr bixin, lê ku ew dikarin ji aliyê hukûmetê bên çavdêrî kirin. Rêxistinên îranî yê mafên mirov daxuyand ku 41 rojnamevan, 4 „bloggeur“ û xwendekarekî fransî hatin ragirtin, ji bo ku wan fotoyên xwepêşandanên dawîn li Îranê kişandin û ew bi riya e.mailê şandin.

Li Îranê, 60.000 kesên ku di warê „blog“ de çalak (aktîf) in û 23 milyon jî ku entêrnêtê bi kar tînin hene. Di dema hîlbijartinên serokî li Îranê de, ji kêmasî ve 38 malperên nuh ên entêrnêtê ku bi zimanê farisî bi BBC, ku rûpela entêrnêtê ya gelerîtîrîn e, re pêwendî dikir, hatin dîtin. (*azady.nl, E Kurd, 07.08.2009*)

ÎDAMKIRINA 13 KURDAN

Di 15 Tebax 2009 de, Rêxistina Mafên Mirov li Îranê di malpera xwe www.hra-iran.org de navên 13 bazarganên ku ji aliyê hêzên ewlehiyê yê îranî di 20 rojên dawîn de li navçeyên sînorî yê Kurdistanê hatin kuştin weşandin. Sedema vê yekê ew e ku van bazarganan di 13 Tîrmeh 2009 de, bi hinceta bîranîna sersaliya 20mîn a kuştina Dr. Abdulrahman Qasimlû, firoşgehên (dikkan) xwe girtin (li bultena me ya buhurî binêre).

TAWANBARKIRINA BEHAIYEKÎ

Di 19 Tebax 2009 de, merivekî ku ola wî behaî ye, Zabihollah Raûfî, ji bajarê Sinê (Sanandaj), li

Kurdîstana Îranê, bi salek zîndan hat tawanbar kirin û birin girtîgeha Minaabê. Jêpîrsîna wî bê pergaleke (nizam) zagonî (qanûnî) ya fermî û bê amadebûna parêzerekî (avukat) bû. Bi ser de jî, ji buroya polîsê dîzzî ferman (emr) ji 18 kes ji heval û endamên malbata wî yê misilman re hat dayîn ku divê ku pêwendî bi malbata Raûfî re nekin. (*hra-iran.org, 29.08.2009*)

BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ

Ji 21 heta 23 Tebax 2009, leşkerê îranî ji nuh de navçeyên sînorî yê Berdênaz û Çiyayê Kodê ... li qezayê Hacî Umranê, li Kurdîstana Iraqê, bombe kirin. Gelek zarar bûn. (*pukmedia.com, 21, 23, 24 û 25.08.2009; peyamner.com, 24 û 25.08.2009; Al-Hayat, 25.08.2009*)

SEREDANA GORA, SEROKEKÎ KURD, IHSAN NÛRÎ PAŞA

Di Tebax 2009 de, ji bo bîranîna bangkirina “cihadê” ya Ayatollah Xomeynî li dijî Kurdên Îranê, Kurdên Tehranê çûn gora Gêneral Ihsan Nûrî Paşa, Kurdekî Tirkîyê ku serhildana kurdî ya 1927 a Çiyayê Agirî ajoti bû, û gul danîn ber we.

Di dema vê serhilana mezzin de, hêzên leşkerî yê tirkî û îranî bi hev re kar kir û rejîma îranî Ihsan Nûrî Paşa ragirt û bir Tehranê. Ew tê de heta mirina xwe jiya. (*avestakurd.net, 27.08.2009*)

KURDISTANA SÛRIYÊ

BERPIRSIYAREKE KURD TÊ RAGIRTIN

Di 29 Tîrmeh 2009 de, hêzên ewlehiyê yê sûrî ketin mala Banû Rojîn Remo li Menbêjê, li nêzîkî Helebê, û ew bin çav kir, Rêxistina Mafên Mirov li Sûriyê, MAD, di 02.08.2009 de got.

Banû Remo endama rêxistina jinan Stêrk e. Heta nuha çarenûsa (qeder) wê ne xuya ye. (*Soparo/MAD, avestakurd.net, 03.08.2009*)

DU SERBAZÊN KURD TÊN KUŞTIN

Di 09 Tebax 2009 de, malbata serbazê (esker) kurd, Hogir Resûl Hiso, 22 salî, hîn bû ku kurrê wê di dema xizmeta leşkerî de mir û ku sedema vê yekê kontakteke êlêtrîkî bû !

Ev nûçe ji aliyê Rêxistina Kurdî ya Mafên Mirov li Sûriyê, MAF, hat weşandin. Hiso ji 8 mehan de

xizmeta leşkerî li Quteyfê, li nêzîkî Şamê, dikir. Ew li Qamişlî, li Kurdîstana Sûriyê, hat gor kirin.

Ev serbazê 26mîn e ku ji dema serhildana kurdî ya 2004 de tê kuştin. (*Soparo/MAF, avestakurd.net, 10.08.2009*)

Di 14 Tebax 2009 de, heman (eynî) rêxistina kurdî MAF daxuyand ku Ehmed Mustafa Ibrahîm di dema xizmeta leşkerî de hat kuştin. Berpirsiyarên leşkerî got ku wî xwe bi çekê xwe kuşt ! Ev xort ji 8 mehan de xizmeta leşkerî dikir. Ew li gundê Goranê, li navçeya Efrînê, li Kurdîstana Sûriyê, hat gor kirin. (*avestakurd.net, 14.08.2009*)

BERPIRSIYARÊ PARTIYEKE KURDÎ TÊ RAGIRTIN

Di Tebax 2009 de, sekreterê giştî yê Partiya Kurdî ya Çep, Muhammed Mûsa, li Dirbêsiyyê, li Kurdistana Sûriyê, hat ragirtin û radestî (teslîmî) Dadgeha leşkerî ya Qamişlî kirin. Ji wî derî, ew hat şandin zîndana vî bajarî.

Ji bo ku ew ji berê jî hati bû girtin û piştê, berê ku maweya (muddet) girtina wî kutah (xelas) bibe, hat berdan, ji nuh de hat girtin !
(avestakurd.net, 13.08.2009)

NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

MIRINA STANBÊJÊ ERMENÎ ARAMÊ TIGRAN



Di 07 Tebax 2009 de, stranbêjê ermenî yê navdar, lê ku bi kurdî distira, Aramê Tigran, li nexweşxaneyê Atîna, li Yûnanistanê, ji sedema rijîna xwîna serê xwe, mir.
(netkurd.com, avestakurd.net, pukmedia.com, rudaw.net, 08.08.2009)

Aram li Qamişlî, li Kurdistana Sûriyê, di 1934 de bû. Malbata wî ji sedema nijadkujiya ermenî ji Kurdistana Tirkîyê Reviya bû. Hezkirina wî ji muzîkê di 9 saliya wî de dest pê kir. Wî nemaze bi kurdî, lê bi erebî, ermenî û tirkî jî, distira. Berhemeke pîrr mezzin li paş xwe hişt : 11 album, 237 stranên kurdî, 150 yên erebî, 10 suryanî, 8 yûnanî ... Ji derveyî Kurdistana Sûriyê, ew li Ermenistan, Beljîka û Yûnanistanê jî jiya.

Aram dixwest ku li goristana ermenî ya Diyarbekirê, li Kurdistana Tirkîyê, bê veşartin, lê desthilatên tirkî ev yek ne hişt, ji bo ku netewahiya wî ya tirkî nîn bû. Loma, li ser daxwaziya malbata wî, ew li Bruksêlê, li Beljîka, di 17 Tebax de, bi amadebûna jimareke mezzin ji Kurd û Ermenîyan hat gor kirin.

(netkurd.com, avestakurd.net, 11 û 17.08.2009 ; info-turk.be, 14.08.2009)

FÎLMEKE KURDÎ LI ALMANYA

Di 13 Tebax 2009 de, filma filmçêkerê kurd Araş Riahî, « Qêliyê azadî », li eywanên sînema yên bajarên almanî yên cihê hat nîşan dan. Ew rêwîtiya zor a du malbatan, kurd û faris, ji Îranê ber bi Otrîşê (Avusturya, Nêmsa), dibêje.

Fîlm 110 xulek (deqqe) dajo. Ew bi kurdî û farisî û bi sernivîsên almanî ye. Heta nuha, wê 6 xelatên navneteweyî, ku ji wan xelata baştirîn fîlm li Fêstivala Vyênna, standine.
(netkurd.com, 13.08.2009)

DÎLANÊN KURDÎ LI POLONYA




Ji 07 heta 08 Tebax 2009, 11mîn Fêstivala Navneteweyî ya Tatarên Polonya « 11th Summer International Lore Academy of Polish Tatars », li bajarê Sokolka, navçeya Podlasya, li Polonya, bû. Ew ji aliyê Rêxistina Tatarên Komara Polonya, desthilatên navçeyî û navendên çandî yên Sokolka, li bin patronaja serokê polonî, Lech Kaczynski, bû.

Di 08 Tebax de, mêvanên ji Kurdistanê çûn seredana goristan û mizgefta misilman a Bohoniki. Piştî nîvro, komên dîlanên folklorîk ên lituanî, byêlorûsî, bosniyakî, tatarî û kurdî beşdar bûn vê festivalê.

(krg-polonya.peyamner.com, 13.08.2009)

PÊŞANGEHEK LI ZÎNDANÊ



Di 13 Tebax 2009 de, merasîma dayîna bawernameyan (diplom) ji koma 12mîn a akadêmiya leşkerî ya zîndana Sûsê bû. Ev zîndan a hukûmeta fêdêral a iraqî ye, lê li nêzîkî Suleymaniyê, li Kurdistana Iraqê, ye.

Bi vê hincetê (munasebet), girtiyekî kurd, Huseyn Fiqa, 98 tabloyên xwe li hundirê zîndanê, bi amadebûna ronakbîr, hundermend û rojnamevanan, raxistin. Vekirina pêşangehê ji aliyê Cewher Kirmanc, nimînendeyê Celal Talabanî, serokê Iraqê (kurd), ji bo çand û agahdariyê, hat kirin.

Huseyn Fiqa ji Kurdistana Sûriyê ye. Berê çend salan, ew ji aliyê serbazên (esker) amerîkî li Tel Koçer, li sînore sûrî, hati bû ragirtin û radestî (teslîmî) dadiya (edalet) iraqî kirin. Dadmendekî (hakim) şovînî ew bi 15 sal zîndan tawanbar kir. Lê Fiqa hîn jî ji hundirê zîndanê, bi riya wênekêşiyê (resm), hezkirina xwe ya ji Kurdistanê nîşan dide.

(avestakurd.net, efrin.com, 14.08.2009)

5 BÛRSÊN XWENDINÊ JI ZANÎNGEHEKE ALMANÎ

Di 13 Tebax 2009 de, zanîngeha almanî ya Dortmundê biryar stend ku 5 bûrsên xwendinê di warên abor, çandin, zanist, endazî û enformatîkê de, ji bo sala 2010-2011, bide Kurdên Iraqê.

Ev biryar di dema seredaneke şandeke wezaretê perwerdeya bilind a Herêma Kurdistana Iraqê de, bi serokatiya wezîr Idrîs Hadî, hat stendin.

Nuha, 3 xwendekarên kurd ên zanîngeha Duhokê li Dortmundê dixwînin.

(pukmedia.com, 14.08.2009)

FÊRÊN ZIMANÊ KURDÎ LI KURDISTANA SÛRIYÊ



Derwêşê Xalibê Derwêş, endazekî (muhendis) enformatîkê, di hevpeyvîneke Silêman Demir di 2007 de pê re de, daxuyand ku ji 2003 heta 2007, 5.800 Kurd xwendin û nivîsîna kurdî hîn bûn û bawername (diplom) stendin.

Piştî ku Derwêş xwendina xwe ya zanîngehî li Parîs û Pragê kutah (xelas) kir, ew di 1977 de vegeyriya

Qamişlî, Kurdistana Sûriyê. Di 2003 de, wî Komîta Fêrbûna Zimanê Kurdî ava kir. Fêr li navçeyên cihê yên Kurdistana Sûriyê û li Beyrûtê, li Lubnanê, bûn. Hin ji yên ku bawername stend, bi dora xwe bûn mamoste.

(avestakurd.net, rizgari.org, pukmedia.com, 21.08.2009)

MALPEREKE KURDÎ YA MATÊMATÎKÊ

Malpereke entêrîntê ya zanyarî (ilmî) bi kurdî, www.mamematikakurdi.com, nuh ji aliyê Hasan Güneyli, endazekî (muhendis) êlêktrîk û êlêktronîkê, hat vekirin.

(kurdistan-news.net, 25.08.2009)

OPÊRAYEK BI KURDÎ

Casimê Wezîr, Kurdekî Gurcistanê ku li Almanya dijî, opêrayek li ser bingeha çîroka kurdî ya navdar, *einde kolonnen*

Evdalê Zeynikê, dinivîse. Û ew rêzefilmekê, bi hevkarîya 30 kesan, jî çêdike.
(*Kovara Rûdaw, 25.08.2009*)

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE



Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.